HAWAR a nû

Hizrî ~ Ramyarî ~ Rewşenbîrî

Kombenda Kawa Bo Çanda Kurdî Derdixe

Çavdêrê Gişti

Selah Bedredîn

Desteka Nivîskara

Dr. Birah m Mehmûd
Ebdilxaliq Sersam
Vedan Adem

Şîretkarên Nivîskara

Dr. Mihemed Ezîz Zaza
Ferde Cemîl Paşa
Foad Gemo

Derhênana Hunerî

Îsam Hecî Tahir

Çapa Eliktronî

N. Zaza

Naverok

Rastiyên nû di cengên destûrî de	**SERGOTAR**	**120**
Axaftina Serok Mesûd Barzanî ya di merasima anîna termên enfalkiriyan de		**118**
Jibo Bîranîna Ronakbîr û Zimanzanê Gewre yê Gelê Kurd: Şikur Mistefa		**113**

Çewaniya Firotina Kovara Hawar nû :
Pişkdarî jibo yek sal:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (12000) Dînar
Kesan (10000) Dînar
Pişkdarî jibo Şeş Heyv:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (6000) Dînar
Kesan (5000) Dînar
Jibo bêtir pêzanîn peywendiyê Bi Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî bike

Hewlêr - Şoreş - Cada Selahedîn Tel : 2240441 - 2242843

binkeykawa@hevgirtin.net www.hevgirtin.net

sergotar

Rastiyên nû di cengên destûrî de

Pirosêsa siyasî di vê qonaxê de li pêtiriya welatên deverê îro tê niyasîn bi dubare darîştina destûrên nû, jiber pêwîstên millî û nîştimanî yên çarenivîs saz û çespandina guhorînên pêtivî li ser astên siyasî û rewşenbîrî, çivakî û abûrî, û yên merc bo avakirina dewleta hevçerx û veguhastina desthelatê û çespandina pirensîpên demoqratiyetê û mafê gelan di dest nîşankirina çarenivîsê xwe û mafên mirov.

Heger pirogramên siyasî û pilanên geşepêdanê rêka dirist bo gihiştina armanca destnîşan dike di hindek qunaxan de ko dibê dirêj yan kurt bin, belê destûrê ko armanca bitiriya gele herdem simtê stiratîcîk diyardikê û xalên ko derbirînî ji helwîst û berjewndyên komê hembêz dikê û derbirînî ji girêbestekê di navbera pêkhatên gel de dikê, eve li gor pênasa kilasîk bi gişti ya destûrî, di despêka vê çerxê nû giringiya nûkirina destûra mezintir bûye da ku li gel pêşveçûnê biguncin û dîsan jî hembêziya têgehên nû li dor pirensîpên ko bûne mercên guhorînê û derbaskirina aloziyan û bi hêzkirina yektiya nîştimanî, mîna mafê çarenivîs bo gelan di hindek welatan de li

şûna wî durişmê fireh û bê serûbin.

Çareserikirina doza netewa bi rêka kûrkirin û bi hêzkirina mafên hawelatîbûnê.

Anko berzkirina hawelatîbûnê li ser kîsê netewayetyê–Ko ev—— bixwe mandalkirine bo pirsa netewî û dest nîşankirina regezên siyasî û rêveberî û cugrafî û dîrokî yên ku mafên wê bi zelalî di parêz e di sînorekî bo çewisandina neteweyî û kiriyarên nejad perîsî ko metirsiyên mezin li dûv re peyda dibin çi li ser astê aştiya di navbera gelan yan jî yekîtiya welatan, her wesa jî pirensîpên demoqrasiyê û mafên mirov û afretan û maf û azadiya olan û mezheban.

Dîsan jî nûkirina destûran ne bi tenê girêdayî pirensîpên siyasî û felsefî û rewştî û mafan, belê bo dîtina mîkanizma bi cih anînê bi şêweyekê dad perwerane mîna şêweyê (Li hevhatinê)Yê pêwîst û çivakên ko komeke pêkhatên netewî hembêz dikê li şûna diktatoriyeta zorînê (bitiryê) ko li gelek welatan tê bi karanîn û bi navê bitiriya dengan çarenivîsê netewên biçûk û kêm bi destê neteweyên mezin û desthelatdar tê nîşankirin.

Di vê warî de raya gişfî li cîhanê û bijareyên siyasî û rewşenbîre û bizavên civakê sivîl dûvçûna pirosêsên dariştina destûrên nû li efxanstanê û welatên bulqanê û ewropa rojhelat û sûdan û îraqê û yê herêma Kurdistanê yan ji wan guhorînan ko li ser têne kirin mîna yê misrê yan jî amadekirinên ko têne kirin bo dariştina destûrî berî ruxiyana rijêmên diktator mîna sûriya, ev hemî tê kirin li ser kavilên destûrên rijêmên totelîtarî û tyoqiratî, û ev bi xwe nîşana kûrbûn û rastiya asoyên guhorînên hatine kirin û yên bêne kirin li ser astê cîhanê û zingil lêdane bo destpêka qonaxeke nû di jiyana gelên tihniyên azadiyê, rizgariyê, aştiyê û pêşveçûnê.

Axaftina Serok Mesûd Barzanî ya di merasima anîna termên enfalkiriyan de

Termên hindek kurdên ko li başûrê Iraqê hatibûn kuştin û di gorên bi kom de hatibûn veşartin anîn Kurdistanê. Kesên termên wan hatine anîn kurdên ji Barzan in û ew di sala 1983-ê de hatine kuştin. Serokê Iraqê Celal talebanî, serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî, serokê parlamentoya Kurdistanê Ednan Miftî û serokê hikûmeta herêmê Nêçîrvan Barzanî û berprisyarên Emerîka û Brîtanyayê di merasimê de amade bûn. Serokê Iraqê Mam Celal Talebanî axaftinek kir û behsa Barzan û Barzaniyan kir. Ere axiftina serok Mesûd Barzanî yê :

Demewê supasî berpirsanî hikumetî Êraqî bikem ke xoyan amade kirdbû emrro ewanîş lem rêwiresmeda beşdarbin, bellam be hoy xirapî keş û hewawe neyantwanî bo Kurdistan bên, ême wa hîsab dekeyn ke beşdariyan kirduwe û legell êmedan, zor zor spasiyan dekeyn.

Cenabî Mam Celal zor le taybetmendîyekanî Barzanî bas kird, bellam dîsan min be pêwîstî dezanim ke kurteyek le mêjûy barzantan bo bas bikem. Çunke pêm waye xedrêkî gewre lew mêjûye kirawe, ke ta êstaş be tewawetî nezanrawe û dujminanîş hemîşe hewlliyan dawe ew mêjûye pir le seruriye bişêwênin.

Sed sall pêş le êsta rojhellatnasêkî Berîtaniyayî ke xellkî Skotlenda buwe be nawî "Wîgiram" hatote Êraq û Kurdistan û paşan kitêbêkî be nawî "Mehd El-Beşeriye" nûsîwe. Ew rojhellatnase serdanî Barzan kirduwe û çawî be Şêx Ebdulselamî şehîd kewtuwe ke xoy le kitêbekeyda dellê:

Daway lêkirdim boy rêk bixem ta bo Lenden sefer bikat, ke lêm pirsî bo ew seferey dekey, gutî: Demewê bêm legell melîkî Berîtanya basî serbexoyî Kurdistan bikem. Her le ser ew rêbazeş ta çuwe bin petî qenarey usmanîyekan serî bo dujminan daneniwanda. Şêx Ehmedî Barzan 12 sall le zîndanekanî Besre û Bexda zincîr be dest û pê bû. Bellam bo yek satîş qibûllî nekird nameyek bo rijêmî melekî binûsî û daway lêburdinî lêbikat, ta şorişî 14 î temuz, ewkat le zîndan hate derê.

Mela Mistefay Barzanî legell 500 neferî Barzanî sinûrî 3 dewlletî birrî, le gadar ta aras her bo ewey ser bo dujminan şorr neken, le rojêkî lem şêweyeda zor sexte ke mirov bitwanî teibîr le şiurî xoy bikat. Bellam ême perwerdey qutabxaneyekîn ke fêr kirawîn, jiyan le pênaw ew mergedaye ke le pênaw gel û willatdaye, emaneş le pênawî kurd û Kurdistanda şehîd kiran, bellam be xedir bê ser û şiwên kiran. Le rûy ayîniyewe Barzan terîqey Neqşebendî hellbijard û be tewawetîş cêbecêy kird. Ke eme yeksanîyekî tewaw le nawçekeda berpa bû. Zor le eşîretekanî dewruberî Barzan dawayan kird bibin be beşêk le Barzan leber ew edaletey berpa bû. Le Barzan tenanet ew cu û mesîhiyaney ke le Barzan dejiyan le katî awarebûn legell Şêxî Barzan deroyiştin û îxtiyarî çarenûsêkî nadiyariyan dekird lewey le nawçeke bimênin leber ew edalet û misamehey le nawçekeda hebû.

Barzan eqîdeyekî neteweyî û eqîdeyekî ayînî bû, cewherî dînî hellbijard, dîn le tefsîrî eqîdey barzanda exlaqe, exlaqî berz, be exlaqî berz detwanî dillsoz bî bo dîn û bo willatî xoşî. Bawerr nakem hîç şiwênêk le Kurdistan mabê, le Kurdistanî gewreş ke xwênî rolleyekî Barzan lê nerijabêt. Her le sSne û Seqiz ta degate Wan û Erzerûm. Kam şaxî Kurdistan mawe ke şehîdêkî lê nedabêt ta "xwaruyî Êraq le semawe û Erer".

Ewe komellêk le şehîdanman dozînewe û emrro lêren. Eweyke le sallî 1983 be ser barzaniyekan hat, tolle bû, tolley dujminanî kurd û Kurdistan, be taybetî le barzanîyekan leber ew hellwêstaneyan, le hellwêstêk ke Şêx Ebduselam damezirênerî bû, Şêx Ehmedî Barzanî dirêje pêderî bû, Mela Mistefay Barzanî ke qutabî ew qutabxaneye bû, tolle bû lew hellwêste

û le merdayetiyey ke hîç katêk seriyan bo dujminan şorr nekird û ewe bû ke le sallî 75 ke destiyan be teirîb û be ragoztinewey xellkî Kurdistan. Yekem gund le Kurdistan ke destiyan be ragiwaztinî kird, Barzan bû.

Le sallî 83 le katî şerrî nêwan Êran û Êraq be behaneyekî bê esas ke giwaye barzanîyekan yarmetî êraniyan dawe lew şereda. Ew barzaniyane hemûyan dest beser bûn, hemûyan hawllatiyek bûn bê tawan û hemûyan lew orduga zoremlîyane bûn. Le Quştepe, le Behreke, le Herîr û le Soran. Tenanet eger waş bê, ewaney ke şerrî rijêmiyan kird ew feqîrane nebûn ke lêre le ber destî ewanda bûn. Paşan rijêm le bîrî çûbû, şerrî ême legell rijêm pêşî şerrî Êran û Êraq bû, şerrî ême le gell rijêm diway tewawbûnî şerrî legell Êranîşda her berdewam bû. Ewey emane be yarmetî gardî nîştimanî û dezgakanî asayiş be taybetî bem tawane hestan ke 8 hezar Barzanî le temenî 10-12 sallî ta degate temenî 80 û 90 sallî. Hemûyan yekem car ragiwaztiran bo Ebu Xirêb û diwayî le Ebu Xirêbewe bo "Besiye" ke nahiyekey le "Semawe"yî nizîk sinûrî Siudiye. Înca lewê her şewêk nizîk 100 ta 120 kesiyan debirdin û gule baraniyan dekirdin. Hemûyan lewên.

Diway rûxanî rijêm ême zor hewillmanda ta bizanîn mesîrî enfalekan be gişti çîyan beser hatuwe. Faylî barzanîyekan çunke le sallî 83 barzanîyekaniyan bo başûr bird, zor le serexo ew tawaneyan kirduwe, ew pelepeleyan nebuwe, wekû enfalî sallî 88. Leber ew e zor be rêkupêkî şehîd kirawin û be rêkupêkî xirawnete naw çallî be komell. Ew fayley ke destîş kewt hemû tefasîlî têdabû ke kê destûrî dawe û çon gîrawin, ew berrêweberî asayişey ke ew kate le Semawe bû û ew tawaney cêbecê kirduwe le katî raperrîn derkewt ke berrêweberî asayişî Silêmanî buwe û be destî rollekanî Kurdistan û rollekanî şarî Hellmet û qurbanî kujrawe.

Lêreda demewê spasî bê payanî danîştwanî şarî Hewlêr û dewruberî bikem. Çunke rijêm ke piyawekanî girt, rêgey jiyanîşî le jin û minalekanî best. Bellam xellkî beşerefî Hewlêr mucazefeyan be jiyanî xoyan kird û be hemû rêgeyek hewlliyanda ke îzin neden ew jin û minallane hest be bê kesî biken yan le birsan bimirin. Leber ewe ta ême mawîn ew çakeyey xellkî

Hewlêr û dewruberî le bîr nakeyn, çakey xellkî Deştî Herîr û Deştî Soran lebîr nakeyn. Çunke dîsan zor zor yarmetiyan dawin û zor lew gencaney ke rizgariyan bû xellkî ew nawçane yarmetiyan dawin û le malle xoyan şardûyannetewe û bo şiwênêkî aramitir derbaziyan kirdûn. Berastî ême beme serberzîn û carêkî dîkeş dellêm ta ême mawîn qerzdarî em cemawere be şerefeyn.

Lêre demewê amaje be rollî wezaretî mafî mirov û be taybetî rollî diktor Mihemmed Îhsan wezîrî mafî mirov bikem ke eme dû salle be pêy ew faylaney be dest kewtûn xerîk buwe û biwêrêkî zorî nîşan dawe û be rastî maweyek yarî be jiyanî xoy kird ta çuwe gorrî doziyewe ke nizîkey ew 500 kesey têdabuwe û hemûyan leber cel û bergiyan camedaniyekaniyan nasranewe ke emane barzanîn û ta em derfete hate pêş û em beşeman hênanewe. Demewê be kesukarî hemû enfalekan û kesukarî hemû barzaniye enfalkirawekan billêm eme 500 kese le koy 8000 kes, demewê be bira feylî û germiyanî û badîniyekan billêm, ta yek neferî ême mabêtin, hewill û teqelay ême berdewam debêt û debê hemûyan bênînewe bo Kurdistan. Eme piroseyekî berdewam û direj xayen debît. Ta yek neferîş mabêt û bidozirêtewe û boman bikirêt bîdozînewe, nahêllîn le başûr û lew şiwênaney dîke bimêninewe û hemûyan bo Kurdistan dehênînewe.

Bellam êsta emane leber cemedanî sûr û cil û bergekaniyanewe be tekîd boman rûn botewe, egeyna ewe bew manaye nîye ke le serwî xellkêkî dîkeman da nabêt ya xud her ewenden, emaneş 500 le koy 8 hezar kes, ême 182 hezar kes kurdman bê seruşwêne, be Feylî û be Germiyanî û be Badînî û be Barzanî û ta yekêkiyan mabît wîjdanî ême asude nabêt û ême natwanîn hest be asûdeyî bikeyn. Ta hemûy ewane nehênînewe, mebestîş lêreda eweye bo ewey newey ayindeşman têbigen ke çi beser ême hatuwe û çi be ser kurd hatuwe û têşîbigen ewey be dest hatuwe belaş bedest nehatuwe û kesîş xêrî pênekirdûyn û hemûy bew qurbaniye gewreye buwe ke êsta leber çawmane.

Nazanim diway aşkira bûnî em hemû tawanane kesêk debê le cîhanda gileyîman lêbikat katêk ême daway zemanet dekeyn ke carêkî dîke enfal nekirêynewe, carêkî dîke kîmyabaran nekirêynewe. Ewey gileyî dekat ba bê û

giwêbgirê le ax û azarî ew dayikane ba bê temaşay ew hemû gorre be komellane bikat ba biçêt û Hellebce bibînêt. Le mawey dû sê deqeda 5 hezar jin û minall û xellkî bê tawan û feqîr û hejar giyaniyan le destda.

Renge zor kes wa bîr bikatewe ke ême debê tolle bistênînewe. Le katî raperrînî sallî 91 min hemîşe serberz bûm bewey û şanazîm bewey dekird ke yekêkim lem gele, yekêkim le xellkî Kurdistan, bellam be taybetî diway raperrînî sallî 91 ziyatir şanazî bewe dekem ke yekêkim le xellkî Kurdistan, çunke diway ew hemû tawanane be hezaran serbazî Êraqî esîr bûn û kewtine dest xellkî Kurdistan. Hêşta birîndarekanî Hellebce le xestexanekan bûn, hêşta zor birînî dîke sarêj nekirabûnewe. Înca yek serbaz nekujraw û îhane nekira. Hemûyan azad kiran û gerranewe bo naw kesukarî xoyan. Emeye serberzî, emeye piyawetî, emeye merdayetî, xwa tolley em mîlletî lewane kirdewe. Fermûn seyr biken le celade gewrekeyan ra bigre ta degate kemtirîn kesiyan, yan be dest yektir kujran û yan xud rezîl û sefîl bûn û kes nazanê çîyan beser hatuwe û le kiwên, xwa tolley lê standûn "
."

Tolle eweye ke ême pabend bîn bew exlaqe berzey xoman, yekêtî rêzekanî xoman pitewtir bikeyn, xerîkî awedankirdinewey willatî xoman bîn, xerîkî damezirandinî damudezgay yasayî û destûrî bîn, xerîkî demezirandinî damudezgakan bîn, xerîkî ewe bîn hukmî yasa biçespênîn le willatî xomanda û bextewerî bo gelekey xoman bênîn.

Jibo Bîranîna Ronakbîr û Zimanzanê Gewre yê Gelê Kurd: Şikur Mistefa

Li rojî 18.09.2003 da ronakbîr û wergêr û bîrmendî gewre yê Kurd(Mamosta Şikur Mistefa) li temenî 79 salîya xo da li şarî Hewlêrî paytextê herêma Kurdistan da, cara dawî dilê wî lêda, xatir ji gelê xo xwest, berê xo da rêyek bê veger û bo hete hetyê çavê xo vegirt. Mamosta Şikur Mistefa ronakbîrekî wek ensîklopedî bû û her weha her çar zimanê(Kurdî, arebî, farisî, tirkî) bi hemû zaravayan ve dizanî. Ustad û şareza bû, herweha wergêrekî bêhevta û bi serhev da nizîkî çil pirtûkan li paş xwe hişt.

Şikur Mistefa ji devera Germiyanê ya ser bi Kerkûkê ve ye û ew sala 1924-ê li herêma Qerehesenê hatiye dinyayê. Ko li temenî neh(9) salîya xo da babê xo wenda dike, dayika wî bi hejarî û derdestî û sêwîtîyê wî xwedî dike. Li salên 1932-an têne Kerkukê û dayika wî li wê derê wî birêdike bo xwendina qurana pîroz. Piştî xetimkirina quranê hînê zimanê turkî, farisî û arebî dibe.

Li sala 1941-ê da dibe feqe. Li sala 1947-ê diçe Bexdayê û li qutabxaneya "Alhidayet Alîslamît"î dixêne. Li sala 1949-ê da jî li kolêjî Şerîhe wergirtîye û li sala 1955-yê lêderçûye. Li sala 1957-ê da bo mamosteyî dest bi kar dike. Heta salên 1970 gelek caran ji layê hikumetê ve jibo bajarên dî tête nefîkirin. Paşê li salên 1970-1971-an da tête guhêzerandin bo rêvebirîya xwendina Kurdî. Xwendina navendî ya kurdî heta pileyê dawî cîbecî dike û ligel mamosta û roşinbîrên din kitêbên dersdayin û qutabxaneyan amade kirin bo kurdî.

Li sala 1975-yê da li damezirandina korrî zanyarî yê kurd li Bexda da cî digre û 1977-ê da dibe sikreterê giştî yê qorrê zanyarî. Piştê ko Baas bûye deshelat, qorrê zanyarî yê kurdî jî tête

helweşandin û mamosta Şikur dikin pisporê ziman di korrê zanyarî yê Iraqê da. Desteyê Kurd li sala 1998-ê da tête Kurdistanê û sergermî karê wergêran û kitêb çapkirin û damezirandina qorrî zanyarî yê Kurdistan debêt. Mamosta Şikur li warê wergêrandinê jî da hinek kitêbên mêjûyî û fikrî û romanî ji zimanê tirkî, arebî, farisî da bi zimanekê yekcar şîrîn û rewan wergerandine kurdî. Ji wan 5-6 rommanên Yaşar Kemal wek *Efsaneya Çîyayê Agirî, Teneke, Efsaneya Koroğlu, Zevî Asin û Asîman Mis* û wd. ji tirkî wergerandîye ser zimanê kurdî.

Şikur Mistefa heta nûho îmzaya xwe li zêdetirî 40 kitêban daye û wî hem kitêb ji zimanên biyanî werdigerand bo kurdiyê û hem jî bi xwe kitêb dinivîsandin. Wî vê dawiyê kitêba Rohat Alakom ya li ser serhildana Agiriyê ji tirkî wergerand bo soranî û erebiyê.

Şikur Mistefa li Hewlêrê bi merasimeka resmî ko rewşenbîr û siyasiyên kurd tê de beşdar bûn hat veşartin.

***

Sinorêk Li Nêwan Azadî û Berelayî da Heye

Şikur Mistefa

*** Mamosta, çend rojêkî dîke (Nîsanî 1998) çejnî 100 salî rojnamenûsîya kurdî li Kurdistan dest pêdiket, cenabê te yekê nûser û rojnamenûse bi navî bangekanî ev welateyî, rolî binîyatnerî rojnamenûsî kurdî û rolî xanewadey Bedirxanîyan li mêjûyî ferhengî Kurd da çawan heldesengênî?**

Şikur Mistefa: Ez bi xo zor bikarî rojnamenûsîyê ve xerîk nebûme, belam sala par kitêbêka bi dest min kevt bi navî ***Çend Belgeyêkî Kobûneweyên Yekem Komeleyî Xanewadegî û Xêzanî yê Bedirxanîyan li Estembol,*** ew kitêba bizirxe yê kak (Mihemed Teyfun) e ko bi nasnavî (Malmisanij) zor(pirr) dinûsê, ew bi xo kurdê zaza ye, li ser kurmancî dinûse.

Li vê kitabê da nizîkê (44) Bedirxanî hatine nav çalakî û karî rojnamegerîyê ve, ewana li hemû meydanên kargêrî yê Dewleta Osmanî, li edebîyat, li rojnamenûsî û sîyaset û zor tiştê dîke da

rolên gewre girtine. Ewe yê ko dikarim li berîya hemûyan da navê wî bênim (Mîdhet Bedirxan)e ko serpereştîya rojnameya Kurdistan kirîye, pitir li Qahîre ew rojname derhênawe û demeke jî li Swîsra, duwayî ew, Hemed Emîn Bedirxan, Salih Bedirxan û kamîl Bedirxan û komekî navên dîke yên din ko herhemûyan li karî rojnamenûsî da zor aşkirane.

Ew xebat û çalakîya rojnamenûsîyê li seretayî (1908)ê ve dest pêkirîye. Her ew biradere (Mihemed Teyfun) kitêbêka li bareyî rojnamenûsîya kurdî de li çap dawe li salî (1908) ve ta (1984) e, wa bizanin ko wî biresim û navnîşanan û serdêr û babet û zor tiştî dîke ve ew rojnameyên ko li wê demê da derçûne, hemûyan li kitêbêk da belû kirduwe bi turkî. Ewe bi xo nîşanê eweye ko Kurd ji mêje ve xerîkî(pêgirtî, mojûlî) rojnamenûsî ye, belam bi zimanî rojnamenûsî yê wê demê diaxive ko bipiranî bizimanê turkî bûye, xwendewarê kurd ew wexte her biturkî xwendine. Li paşê hûr hûr bi kurmancîya jor û bi kurmancîya jêr (soranî) me tiştên xoş li Kurdistan da belavkirîye. Dîsa li vê kitêbê da ko terceme kirîye zor wêne têda ye û dibînin li rojnameyî kurdî da zor tişt jî sebaret bi dewlet, mafî mirov, edebîyat, ziman, huner û jîyan û guzeranî xelkî Kurdistane ve, hatîye belav kirin.

* Ev xanedanîyê li sereta da serkirdayetî bikirira beşêk li şorişî Kurdistan dikir û duwayî li jêr barudoxêkî dîyarîkirî da guheztîyane bo biwarî rojnamenûsî û ferhengî, wata xanedanîya Bedirxanîyan rasterast heta li ser nav bizutneweyî sîyasî ew kate da neman, belam li nav bizutneweyî roşinbîrî Kurdistan da ta dawîyê jî bo Kurd û roşinbîrîya Kurdî rolî pêşengî yê malbata wan bûye. Ti li vê rûyî ve çawan rolî wê malbatê heldesengênî, nek weku malbat, belku weku ev komele keseyî ko bitêkra li biwarî sîyasîyetê ve guheztîyane bo serkirdayetîya roşinbîrî kurdî, belam li medarêkî dîyarkirî da?

Şikur Mistefa: ***Ewe bi xo tiştêkî zor sirûştî ye, çunke eger seyr bikeyn dibînin li hezar û heştsed û çilî de Bedirxan dewletêkî dirust kirîye. Ew dewlet jî sînorê wî geyîştîye nizîkê Rewandizê. Ji layê dîke va dewleta Paşayî Kor e ko ji Urmê bigre ta rojawayê Dîyarbekir fire bûwe. Ev dewlete, libarî sîyasîye ve bi xo li vê***

serdemê da tiştêkî gewre ye bo milletê Kurd. Aşkeraye ko Bedirxanîyan cige li meydanî rojnamenûsî li biwarê dîke jî da xebat kirine û serkevtî jî bûne. Xuna sê çarêk ji wan li Misir helbûnewe, Ehmed Bedirxan yekêk bûwe ji wan ê ko çendîn filmî sînemayî derhênaye, Leyla Bedirxan hunerkarî hunermendêkî kurd e ko karibûye bibête seroka bale ya Almanya.

* Mamosta her li biwarî rojnamenûsîya kurdî da, evro teknîk û ew cûre pêwendîyê giştîyane yî ko biser dinya da zalin(serdestin, pitir) û ewê ko pê digutirêt cîhangerayî biwarêkî yekcar zor firewanî bo karî rojnamewanî xulqandûwe. Caran ta berê li (10) sal pitir li biwarê edeb û ferheng û hendê car biwarê dîke yê zanistî zal bûn, belam dinyayî êsta pitir hanî rojnamenûs diket û rojnamenûs bo te modî evro û pitir li hemû tiştêkî dîke karîgerîyetî biser pêşkevtinî komelîyetî û aborîyê ve heye. Pêtiwaye li Kurdistan da rojnamenûsî bi manayî hevçerxî evro, hebê waye to li Kurdistan da hest bi bûnî rojnamenûs dekey?

Şikur Mistefa: ***Rojnamenûsî bi xo bi mana sîyasîyekey deshelatî çiwareme. Li rûyî sîyasî ve rolêkî gewre dibînê. Eger amancî rojnamenûsî jî geyandinî heqîqet bî, bi hemû însanêk li astêkî asan û sana û bê girê û gol da, bêguman ew kate(dem) rojnamenûs rolî xo dibînê. Belam sebaret bi wê ko aya li Kurdistan da rojnamenûsî geyîştote ew astê ko lê çaverê dikinê, ewa bi min waye rojnamenûsî yan her tiştêkî dîke yê şaristanîyane yê ev serdeme, li Kurdistan da li bineret da bi barî sîyasî yê mîlletî me, jîyan û guzeranî xelkî Kurdistan û serkirdayetî mîlletî kurd ve girêdayîye.***

* Eger bikarabaye te bi qûlî bas li vê medare firewane yê ko li Kurdistan da rojnamenûsî bijîyanî xelk û astî ferheng û rolî serkirdayetîyê ve bestotewe, bikiribaye.

Şikur Mistefa: ***Min evan hemû bo xo weku tabloyek dibînim ko ev tablo hemû pêwendîya wan bi yekudu ve heye, ji wan her yek kargerîyetî biser ewên dîke da heye. Bitaybet serkirdeyî sîyasî ko dibê li vê qonaxê êsta da zor zîrek û çapuk û bikar bêt. Ew serkirdayetî eger karibe xo bigeyenête hemû malêk, hemû kesêk û li nizîke ve***

hewlî agadarbûn li gîrûgirîftî xelkî da. Ewan ew dem pêmuaye ev serkirdayetîye zor çak diçête nîv dilê mîlletê ve û radeyî cemawerîyetî zêde dekat.

* Li duwakewtuyî rojnamenûsî kurdî li Kurdistan da ta çend serkirdayetî sîyasî li Kurdistan bi berpirsyar dizanî?

Şikur Mistefa: ***Renge zorî bixeme estoy serkirdayetî.***

* Bo?

Şikur Mistefa: ***Renge serkirdayetî li zor rûyewe, pêwîstîye karê rojnamenûsî dabîn biket, belam aya serkirdayetî bo xo duwayî rengdanewey karên xo dikewê. Duwayî ewe, aya bernameyê sîyasî yê serkirdayetî li tiştên zor girîng da rengdidayewe û aya hîç heq û hîsabêk heye? Dibê serkirdayetîya sîyasî programêkî hebê bo ewê li xelk bigeynêt ko kurdayetî li vê qonaxê çawa ye, û pêwîste xelk çawan kurdayetî biket.***

* Wata pêt û waye deshelatî sîysî, li pêdanî azadî û bûnî azadî ko beşêkî zor gewre ye li karî rojnamenûsî da, kem û kurî heye yan kemî dawe yan her neydawe?

Şikur Mistefa: ***Bi min waye azadîyekê zorî dawe, belam dibê lêpirsînewey hebê, çunke azadî ewe nîye min got û bi arezuy xo min çi ji wan xwest bikin û wan çi xwest bikeyn. Azadî wata encamdana ew karane ko pêwîste encam bidirêt.***

* Bes evro li dinya da dibên rojnamenûs li hemû waran -rageyandin- carî wa heye deshelatî sîyasî neçar dibêt liser rêbazêk biruat, yan carî wa heye rageyandin wa diket hendê li hinek dewletan helwêstî nû yê li ber tiştêk wergirin û zor carî jî helwêstî miroyî. Herweha rayek heye ko rageyandinî evroyî dinya bişêweyî gîştî li wirûjandinî hinek babetan da bi sehiw naçê. Ko wata li mirovî dinya da hîç sinurêk bo azadîya rojnamenûsî rewa nîye, bi pêçewaneyî ew qiseyî ko wa rageyandin teebîr li rayî dewletêk biket?

Şikur Mistefa: ***Azadî tiştêke ko li hemû qonaxêk û biwarêk da pêwîste, belam ligel ewe jî da dibê perjînêkî***

hebêt. Dibê kesêk hebê ko bizanê ew azadîye çawan bikar diête. Herweha dibê xelk fêr bikirê çawan azadî bikar bênê, çunke hêşta ême fêr nebûne azadî bikar bênin û li gelek waran da girîftên me hene.

* Beşî duwemî pirsyarên min ewe bû, aya li Kurdistan da hest bibûnî rojnamenûs-bi mefhumî- dikey?

Şikur Mistefa: ***Eger meseleke li çav rojnamenûsî Awrupa û xeyrî me bi xo da lêk bideynewe, barodoxî rojnamenûsî û bûnî rojnamenûs li Kurdistan da, weku çirûskê agirî cigareyek li tarîya şevêk da dibînim.***

* Te bas ji vê kir, ko li seretayî destpêkirina karê rojnamenûsî da, giriftên zimanî yên Bedirxanîyan hebûwe û liber nebûnî zimanî kurdî penayan birîye berve turkî. Bi dirêjayî ev(100) sale giriftî ziman li kol rojnamenûs û karî rojnamenûsî li Kurdistan, nebûyewe û karêkî zorî kirîye ser vê rewşê. Cenabê te hewlê daye ko wa tiştan bi lehçeyek binûsî ko piranîya xelkê li wê têbigeyn. Li heman demî da şan bi şanî ê we kesanêkî weku Hejarî Mukrîyanî, karêkî zor gewreyan li zimanî rojnamenûsî da kirîye û şanazîyêkî gewre bo Hejarî Mukrîyanî bicî ma ko wa li duwayî xo cige li berhemekanî, ferhengêkî kurdî zor gewre jî bicî hiştuwe. Ziman li rojnamenûsî evro di kurdî da çend girîft yan keresteyekî libare, aya rojnamenûs û roşinbîr azar nadet?

Şikur Mistefa: ***Ziman neke her zimanê rojnamenûsî ye, bigre ziman, zimanê jîyan e, zimanê cotyar e, zimanê karker e, zimanê efendî û zimanê hemû mirovêk e û her kese beşê xo lêwergirtîye. Belam eger bitevê zorî tengasî bikeve, ewa renge li rojnamenûsî da birrê zarawe şîyaye bikar bêt ko li meydanêkî dîke da bikar neyêt. Bigiştî bi min waye zimanê kurdî çi bişêweyî kurmancîya jorî, û çi bişêweyî kurmancî xwarê, li vê 50 salên dawî da şan bişanî yekdî zor pêşkevtîne.***

Basî hejmarî xwalêxoşbûn kir, birastî Hejar rolêk zor gewre li palawtinî zimanê kurdî da hebûwe. Bitaybetî şêwezarî Mukrîyanî ko şaîrê klasîk ên gewre li babetî Nalî û Salim û ewane hemû bi vê şêweyê Mukrîyanî şîrên xo gotine. Hejarî Mukrîyanî jî her peyrewê vê rêgeyê bûwe. Ez bi xo

zor bi vî zimanî pêxweşim û her di vê barî da jî min tiştê nûsîye. Bi giştî li Kurdistana Iraq da zimanê kurdî li zor biwarê mirovîyê da, li fizik û kîmya û ewê pê dibên biwarê zanistîyê, hêşta maye. Eve jî her tenê yê me negirtotewe, Turk û Faris û Areb jî hêşta li zor tişt da loqe diken û li dawîya Awrrupa ne. Dîyare ev jî xetayî me nîye û mêjû wa lêkirîne ko duva bikevin û neşên li vê maydanê da, weku ewan pêş bikevîn. Ez pir xoşbextim ko bikarim li gelek tiştî da bikurdî bîr û rayên xo derbirêm.

* Mamosta li duwayê raperîn, qonexekê nû yê li jîyana mîlletê Kurd li hemû biwaran da dest pêkirîye. Li warî ferheng(lîterator) û rojnamenûsî da qonaxêk bû ko divîyaye pitir li hemû warên dîke ew niwênayetîyê pêwe dîyar bê, çunke bidirêjayî karî rojnamenûsî li Kurdistan da, nebûnî azadî astengîkî yekcar zor gewre bûwe liberamber dahênan da. Ko çî bipêçewanewe(biberavajîye) di Kurdistanê da li du raperîn, dahênan kem bûwe û çalakî serhildanî roşinbîrî, bimefhumî ewe ko wa dibiwaye pal bo beşêk ji vê êş û azara mêjûyîyane jî bi awê ko nekarîye li serdemî dîktatorî da çareserîyan biket. Belam bipêçewanewe li vê şeş salên yekemî li du raperîn, cûrê li kujanewe û paşekişê rûdaye û ligor hendê kesan waye ko roşinbîranî Kurd nedikarî ligel azadî da biron. Cenabê te vê dîyardeyê çawa heldisengênî?

Şikur Mistefa: ***Hest dikim ewe tiştêkî sirûştî ye, katêk sîyaset hemû dinya dadigrê dibêt tiştê ko weku nan û avê jê dêt, li hemû meydanêk da xo desepêne. Ew dem biwarên dîke ve dikişêne, merivê hizbî ye û divê basî hizb biket, ewên dîke divê basî rêkxistin biket, ewane jî wenebêt loxetêkî wan ê taybetî hebêt, çunke sîyaset jî loxetî xo heye. Sîyaset loxetêkî xêra û kem temenî heye û li duwayî xo hîç bicî nayelê, wata tiştêkî weku şîhir, yan çîrokêk, yan dastanêk, dirûst naket, tiştêk digotirê û rojane xelk dibîhsin û dawîyê li bîra wan diçêtewe. Katê sîyaset dibê bi axa, roşinbîr dengê kip divêt. Ewe jî we nîye tenha li mêjûyê me da rû dabê. Piranîya neteweyan ew haleteyan dîtine. Bo xune, wextê Emewîyan hatine ser kar, qonaxî firawanxwazî û dinyagîrî Areban newesta. Bi vê pêye jî hemû tiştê mefhumî sîyasî wergirt.***

Tenanet şîhirî jî li vê bazneye da bû. Bi berevajî ve wextêk ko Abasîyan dên sîyaset, tozêk kip dibêt, temeşa dikey li serdemî meemun da ferheng û şaristanîyet geyîştîye çilepope. Ev jî ewê derdixê ko li vê serdemê da roşinbîr pitir henase didat. Li serdemî Abasîyan da dewlet firewanî bi xo ve dît û seqamgîr bû. Ev pêye derdikevê ko seqamgîr rolêkî berçavî li pêşkewtin da heye û bibervajîve barî ferhengî li naseqamgîrî da li piley duwem û sêyem da ye.

** Zor ji wan ên ko êsta xo bi mêjûyî ferheng û rojnamenûsîya kurdî ve xerîk diket, pêyanuaye bigiştî, bixişînî, roşinbîrên Kurd zor kêm e û kêmtir roşinbîrê Kurd li girîft û bûnî xo wûrd dibêtewe û kêmtir bi naxî xo da diçête xwareve. Her bo vê jî li rewşenbîrên di rawşa me da kesên wek Îsmaîl Bêşikçî û zorî dîke hene ko wa hendê kes pêyanuaye li xawen bîr û roşinbîranî Kurd pitir hewl dane li komelî kurdewarî bigeyn û rêwşuênî bo dabinên. Ev dîyaredeye cûrêke li lixobêgane bûn û sipardinî meseleya roşinbîran bi roşinbîranî bîyanî. Bi raya cenabê te ev dîyardeye nav roşinbîrî Kurd ji çîye ve dêt?*

Şikur Mistefa: ***Carê em ji pêşîyê ve bo em bikevne qutabxaneyê arebî û bi arebî bixwênin, li serdemî Osmanîyan da ko li Kurdistana Iraq û Turkîya û li hemû Kurdistan da qutabxaneyê resmî nebûwe û ne bi turkî û ne bi arebî û ne bi farisî me ne xwendîye. Belam ligel wê da jî hucreyen mela û feqêyayetî hebûwe, hucreyên mela û feqîyan, melayên çak bo ew qonaxa sîyasî yê ko Kurd têda jîyawe perwerde kirîye. Belam bo çi ewana melayên çak bûne û li ber çi navê wan heye? Li pêş hemû tiştêk da ev melayane dû tişt qêrbûne; sereta wan bi xo li kelepûrî mîlleta xo geyîştûn û zanîyane Kurd folklorî heye, folklor jî gelek tişte û bi vê pêye bi temametî çunete nav mîllete xo, wata agaya wan li mîlleta wan bûwe, têgeyîştine ewca zor li edebî farisî nizîk kevtineteve.***

* Ligor we waye evana karibûna karîgerî li ferhengî Kurd bikin?

Şikur Mistefa: ***Mebesta min ew bû ko ligel ew hemû melayên çak ên ko wa li sedeyî hevdehem li Kurdistan da hebûwe, em tenya Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî û Nalî û Salim û Mehwî***

man bo mawetewe. Ewan hemûyan karibûne biçine nav mîlleta xwe, ewca liser binemayî têgeyîştinîya ji kulturî mîlleta xo tiştêkî taze fêr bin. Fêrbûna farisî û têgeyîştin li roşinbîrî farisî mercêkî serekî bûwe, çunke nek her Kurd, bigre turk jî her farisî fêrdibûn. Kurd kêmtir şihîrê wî yê arebî heye, belam şihîrên wan ên farisî heye. Nalî û şêx Riza şihîrê wan ê farisî hene, belam min nebihîstîye ko şaîrêkê me şihîrê wê yê arebî hebûbê, eger bûbête jî tiştêkî wa nîye. Hest dikim Ehmedê Xanî û Nalî û Salim û mehwî û ewan, bi temametî ferhengî serdemî xo bi xo helmijîwe, belam liser pencî kulturê xo niwanduyane.

* Mebesta min ewe ye ko bo roşinbîrên me nekarîne cige li pêgeyîştin, li biwarî girîftî ferheng da, deng arasteyî roşinbîrî gelanî dewrûberî jî bikin. Wata ti dibînî yekêkî weku Îsmaîl Bêşikçî roşinbîrêkî turk lê kar liser roşinbîrî Kurd jî diket. Ewe digeynê ko roşinbîrî Kurd nekarîye çareserî girîftên ferhengê kurdî biket bi şêweyekî firewan û bi çûreyêk ko bikaribe ew çaresekirinê bike bi bidengêk û bo derve jî binêrê û arasteyî gelanî dîke jî biket. Çunke roşinbîr û xawen bîrekanî gelanî dîke bi rêgeyê ferheng û karê fikrîyê ve hatine nav gelên me?

Şikur Mistefa: ***Bi min waye divê em dû tiştan liber çav bigrin; ji wan yekemîn roşinbîr divê wirya bêt, ew wiryayîye jî bi mefhumêkî zanistî, wata li vê qonaxê têbigat ko têda dijît. Her weha li hemû qonaxêkî jî da hinde tişt heye divê ev roşinbîre bizanê; bo xewne dibînin yekêkî weku Ehmedê Xanî girîngtirîn karî qonaxekê jîyanî xo pêyewe bûwe ko wa hawar bike bo mîlletî Kurd û ew hemû mîr û beg û ewane kombibine ta dewletêkî merkezî yê kurdî dirûst bikirêt, hawar bo yekgirtîya neteweyî Kurd diket, bi vê jî mefhumî netewî yê kurdî bi manayî xo hênawete gorê.***

Mana wî ewe ye, ev pêngave karibû li vê qonaxê da rolî xo bibînê. Duwem jî, ême xwêndewaraxan ji kevin va fikrê wan bo ewe neçûye xwêndewarî û roşinbîrî bi mesela komelayetî û sîyasî û aborîyê ve bibestineve. Evro dema ewe ye ko roşinbîr li nîgay komelê ve seyrî hemû tiştêk bikar. Ko şihîr dinûsê, bizanê beş komelgayî çend têda ye, ko şanoyek pêşkeş dike bizanî beşî komelî çend têda ye,

mişkileyî komelî çend têda ye.

* Beşêkî zorî li berhemên ko cenabê te wergêrayete ser zimanê kurdî, em dibînin te girîngîyekî zor bi Yaşar Kemal daye. Hemû nûsînekanî Yaşar Kemal û ewaneyî cenabê te girîngî pê daye bi zimanêkî dîke êy cîya ji kurdî, miwaleceyî ferhengê komela kurdewarî ne. Aya cenabê te li vê ruangeyeve bayext bi Yaşar Kemal dawe yan hokarêkî dîke heye ko xwênerî Kurd nizanê. Yaşar Kemal çi tiştêke, ko te piranîya jîyanî xo bo wî terxan kirîye?

Şikur Mistefa: ***Ez ji salên pêncîyan vir da kevtime ser ewe ko wa nûsînî edebîyat, dibê tiştêk bê ko xelk hezî lê bêt. Ewê bi arebî û bi turkî jî ko min xwendine pitir li vê babetî bûn. Îtir birêkevt ko min romanên Yaşar Kemal xwendin, baskirina ji mîlletî Kurd pitir raya min kêşa. Min bi xo û kes û karê xo û gund û mirovên Kurdistanê li van nûsînan da didîteve. Belam ewe ew dinyaya ko Kak Kemal basî diket dinyaya min e, dinyaya xelkê bedbext e, dinyaya xelkane ko weku bi xo dibê "asmanî mis e û dewrî asin e", erze herçend dike hîç bo şîn nabê, asmanî hîç lê peyda nabêt. Wata eweyî dema min xwendiwe basî li mîlletî Kurd dikire, nek tenha mîlletî Kurd, bigre basî li sercem hemû gelê zulim lê hatîye kirin li dinyê dikird.***

Bo evan serincîyan min rakêşa û bûne cîyê keda min.

* Yaşar Kemal ji layî xwênerî welatê me da, li Kurdistana Iraq û ewên li Kurdistana Îranê jî ko bi vê lehçeyê, bi elîf û bê yê arebî dixwênin, pitir bi rêya Şikur Mistefa ve Yaşar Kemal nasîne. Wata xelk wa dizanî zimanê Şikur Mistefa zimanê Yaşar Kemalî jî ye. Mebasta min ewe ye zimanê Yaşar Kemal zimanê turkî ye, li katêk da jî keş û hewayê nûsînî û kesayetîyên Kurd in. Xelkê Kurdistan bi rêya Şikur Mistefa ve Yaşar Kemal dinasê. Katê zimanê Yaşar Kemal kurdî nebê, dibê wasîteyek hebêt da mîllet xoş bikarê wî binasê.

Şikur Mistefa: ***Bi daxe min ta êsta jî Yaşar Kemal nedîye. Tenha min bi wêneyê wî dîtîye. Bi gotina hinek biraderên ku wî dinasin ez ji wan hînbûme ko peyayêkî qisexoş û zor sade kirmanc e.***

* Hoyî çîye ko we berêzan hemû

temen û berhemên wî bi xo bo wergêranî karî edebî û roşinbîrî Yaşar Kemal terxan kirîye, ko te çi hewl da û ji ber çi nedixwest bibînî? Te hewl neda yan nedikarî yan nedivîyayî bibînî?

Şikur Mistefa: ***Mebesta min nebûye bibînim. Herçende dû-sê carê jî çûme Turkîya û min dizanî li kû ye, her hewa li derveyê Turkîya jî min dizanî li Swêde, zor kesan jî li wê ve kaxizyan bo min dinûsîn û digot ewe filan kes li vira ye. Hîç rojêk nehat xîyala min kitêbêk ji wav kitêbên min wergêrandine bo wî bînim. Bo wî xoşim nizanim li ber çi. Taqeta min nebû li rastî da. Pitir mebesta min kitêb û qise xoşeyetî ye.***

* Zor karê rewşenbîrî yê cenabê te birîtî bûwe li wergêranî berhemî nûserî gewre. Pêşiyaye li biwarî wergêran da, li nav roşinbîrî Kurd da bo şayîyek hebûwe liber ewe hemû katî min bi xo bo wergêran terxan kirîye. Êsta dişê bêjî te karêkî baş kirîye?

Şikur Mistefa: ***Hez û arezû fakterê girîng ê karkirina mirov in. Renge ew karên ko min li vê qonaxê da kirine hez ji wan kirîye.***

* Êsta dawîya ew qonaxa dûrûdirêj e, tû ew heza çawan heldisengênî (dinirxênî)?

Şikur Mistefa: ***Ew wext renge pitir ez bi xo bi edebîyat ve xerîk dibûm, belam ewe demeke dîsan li mêjû meyildarim, li tiştê dîke navê. Tiştê dîke jî hebû bikirê bi kurdî, belam bi daxe meseleyî azadî û şiyênî belawkirinê û tiştî wa girîftî dirûst dikir. Herçend min her tiştêk kiribe bo ko bibê girîft min belav kirîye, yaxud min bo xo rêgayek bo wî dozandîye(şopandîye).***

* Êsta li Kurdistan da, cûrêk li westan û paşek jê li karê wergêran da heye. Wergêran zor kêm bûye. Eger eve bi layek liqêranî roşinbîrî kurdî dabinêt, çareserîya vê li çî da dibînî?

Şikur Mistefa: ***Her karêkî hunerî yan roşinbîrî, eger li ceribandina we da serkevtî bît, ewa bi min waye ev karê namir e û dirêjey dibê. Belam eger tiştêkî demî bêt û li pirr peyda bê û henaseyî kurt bê, regî temamî danekutabê, ewe zû dibirêteve û dimirê. Ewe jî manaya wî ewe ye ko xelkekê xo mandû nekirîye, çunke***

karê çak mandûbûnî divê, mandûbûnî jî pêwerî karê çak e.

* Roşinbîranê Kurd, liber xerîkbûnîyan bixwêndineweyî berhemî roşinbîrî, fikrî û felsefî yê bîyanî, pitir bi lasayî kirinê ve xerîk bûn, ewe jî waye lêkirineve ko bîrnekevine. Tenanet li biwarî wergêranî jî da xelk bîr naketeve û xo mandû naket. Ji vê rûyê ve aya li nav roşinbîrê Kurdî da bi kêmasî roşinbîrê serbexo yê Kurd heye, yan têkeleyek roşinbîrekê me li lasayî û destdirêjkirinî roşinbîrê gelanî dewrûber heye?

* *Şikur Mistefa:* ***Te basî fikir kir, fikir malê kes nîye, efkarî gewre li tarîx da mork û nîşanî neteweyan pêwe dîyar nîye. Bixwîne Soqrat û Eflatun li meydanî felsefe da, fikrên wan mûlkê hemû mirovayetî ye. Renge ê me jî zor mirovî me yê gewre hebûbê, belam bidaxewe ji ber ko ewan bi zimanê xo nenûsîne, karê wan çûye ser hîsabî xelkî dîke ve. Egîna ê me jî melayên zor gewre hene bi arebî tiştan nûsîye û li meydanî fiqehî îslamî û kelam da wan karî zor gewre kirîye.***

Bo xune (Beytuşî)yek me heye ko li (nihu)yî arebî da tiştêkî nûsîye ko hîç arebêk neşîyaye li wê astê û bi vê firewanîyê ji wî bidiwêt. Ê me hemû tiştêk me heye, belam li ber ewey kiyanêkî sîyasî û hikumetan nebûwe, me neşîyaye weku xelkê şanazîyan pêwe bikeyn.

* Eger meseleyê nebûna dewlet welawe binêyîn, pêşiyaye bîrmendên gewre û ferhengêkî gewre yê me heye ko derneketîye?

* *Şikur Mistefa:* ***Belê hewandine û derneketîye.***

* Evro jîyan liberdem mirovî Kurd zor qurseasteng gelêk zore, mebesta min ji astengê, her astengê dagîrker û bîyanî nîye, belku basî navxo dikim, basê dinyaya derûnî ferhengê komelî kurdewarî dikim. Ev komelgeye yê ko hemane me naçar dike waha bîr bikeyneve ko ferhengêkî me yê gewre nîye. Bi dest ev kem û kurtîyê jî ve dinalênîn, ti pê dişê ko hemane dikarî pence bo ev tiştî dirêj bikey?

* *Şikur Mistefa:* ***Bi min waha ye hemû mîlletêk û komelgayeke mirovî li her qonaxêkî mêjûyî xo da bîrmend û pîyawî xo heye, belam renge***

mîlletêkê dîke li rûyî jîyanî û fikrî ve li ewê dîke pêşkevtîtir bê, eve jî bi hoyên pêşkevtinî zemanê wê ve ko waha diket hemûyan şanbeşanî yekdî hengaw nenêyîn. Înca ewe bi manayî ew nîye ko ê me bîr û bîrmendî me nîye, hemû tiştêk me heye, tenha yek tiştê me nîye, eger seqamgîrîyekî sîyasî ya me hebê xelkeke fêrî ewe dibê ko pitir ji wê şer diket, bîr biketeve.

* Neslê we, neslê roşinbîran û nûseran, ewên ko êsta li nav mîlletê me bi pence diêne jimêrtin, cûrê li xoşakirdineweyan pêwe dîare. Wata piranîya wan li nav meydanî pirr tengijîye li qeyranî roşinbîrî kurdî da, bûnêkî karê wan nîye, eve jî li demêk da ye ko cîgirên we jî bo dirûst nebûye. Ev dîyardeye nebûnî cîgir û dûrkevtinîya roşinbîranî neslê ê we, li çîda dibînî, pê şiyaye eve çareserîyêkî hebê?

* *Şikur Mistefa:* ***Pêşîyê ewe amaje bi çareser bikeyn, dibê hokareyan dîyarî bikeyn. Wa dizanim zor aşkira ye, eger em li vê qonaxa mêjûyî da bişên şêyîn û lêhatîyî xelk kombikeyne, zor tiştî ji vê peyda dibêt. Renge ev xoşardîneveye jî nemênit. Bo vê pêwîste bizanin nûserî çak û qisezanî çak kam e, mosîqajenî çak kam e. Bo xune(Mam Hêjar) yek heye şahire ewe her tiştêke li xuney Hejar, ew bo li vê meydanê bûnî nîye? Wata ti dibê xelk bibijêrî, emela yekî, layekî dîke hendê li gencan destê xo daweye zor babetî wa ko renge sedan sal berê nûha li Awrupa hebûbê ko çî ewane taze bi taze dên basî ev tiştane dikin.***

* Wa dizanî hatinî rewtî fikrî cîyacîya –helbete ez nabêm çareserî bo kêşeya roşinbîran didoznewe, rewtêkin diên û deron û ewane yên ko resenayetîyan nebê zû dê winde bê-dîyardeyekî xerab e yan çak e, eger bi we xerab bêt ewa ferheng bi çî firewan û gewre bibêt?

* *Şikur Mistefa:* ***Azadî tiştêkî pêwîste, belam anarşîzm nîşanê nexoşî ye. Li pal azadî da anarşîyetî jî heye. Bi min waye dibê cîyawazîyeke li nêvbera azadî û anarşîyet da hebêt. Pêwîste berevrûyê ev kesane bibînewe ko rastîyan weku wan bi xo nageyîştine xelk, çunke erkê azadî geyandinî rastî ye.***

* Ligel ew kesê çi dikey ko azadî

weku pêwîst bikar nahênê?

* *Şikur Mistefa:* ***Ewê ko wa li berêweberayetîyek da zêdeyî ji heddî xo derva û amanca wî tenha dewlemend bûne û vê karê jî ligel sirûştî karekê da naguncê, çi ligel dikirê? Li dewletêkî pêşkevtî û zîrek û serkirdayetîyekî sîyasî ko dilê wî bi mîlletê xo û mêjûyekê disutêt çi lê dike, dibê ew jî waha lê bikirê.***

* Mamosta eger li hemû warêk da dijraberî hebêt, lêpêçanewe li biwarî roşinbîrî da dibê her bi azadî û berengar bûnîya fikrî bêt. Li vê warî da lêpêçanewe çawan çû nîye?

Şikur Mistefa: ***Ez bi xo nabêm bihênî darkarî bikey. Dibêm divê li xelk bigeynî; da bi ewe anarşîyetîyê û azadî waha nabêt û azadî jî ewe nîye.***

* Ca rayekî dîke liser ev boçûnê cenabê te heye ko dibê li Kurdistan da neslêk peyda bûye, zor dinûsê û kêm dixwênête. Tû dişê eve yekêk li fakterekanî anarşîyetî bêt ko ewe jî ji wê ve dêt ko li mesele roşinbîreke baş ê wird nabêtewe?

Şikur Mistefa: ***Bi raya min waye, ewane pitir hez dikin derkevin û xelk basê wan biket. Bo min bi xo her waha bûye, belam girîng ewe ye ko sinûrêk li nêwan azadî û anarşîyet da dabindirêt.***

* Belam bi ya te, sinûrê azadî jibîrkirdinewe û jîyana taybetî ya her mirovêk da, çende?

Şikur Mistefa: ***Azadî bi mefhumekê min ewe ye ko ti mehkumî bi qewanînêkî cebrî ew cîhaneve ko têda dijî. Bo xune rojêk li rojan mirovek nedişê bifirrê, çunke dibê li (yasay kêş) dûr bê, belam ko şiya ew yasaye bidozêteve ewa ew dem bîr li wê dikateve eger hat û şiyan tiştêk dirust biket bifrrê û nekevête xwareve, ewa mana wî wa ye ew azadîyê dirust kir. Wata xo li yasa sepaweke rizgar kir, li vê derê eve azadî ye.***

* Yasa rengbê liser dozandina vê yasayê ko êsta bahs dikir, komelê bîr û ray hebît, ko wata dibê biwar bo giftugo bihêldirêteve.

Şikur Mistefa: ***Hîç manîh nîye û dibê biwar bo giftugo hebê, belam girîng ewe ye bişerr nekin û yekûdî***

tawanbar nekin. Nebêjin ew casuse û ew pîyawî ew û ewe. Wate dema eve sûdî dibêt ko ti bi xo li meydanî xo da azadî bikar bênî, belam girîng ewe ye bo dozandina rastîyan bikarî bênî.

* Ew şêweyî ko ti bo giftugoyî fikrî û roşinbîrî dadeynî, li nizîkê azadîya lîberalî ya fikrî ye, li mesaîlî fikrî da birrwat di lîberalîyet da heye yan na?

Şikur Mistefa: ***Lîberalîyetî li qonax û sîyaseta xo da, xo desepênê û eve jî bidest min û te nîye. Yan ti dê vegerî bo paşve û dabiran, evane wan bi xo dirust bûne û ne li deshelatî min û ne li deshelatî te jî da nîye, belam radîkalîyet heye, dîktatorîyetî jî ko xo desepênê. Ev dîktatorîyetî bo çîye? Aya hîç sûdî heye? Carî wa heye dîktatorîyetî jî weku pêwîstîyekî lêdêt, bi vî manayê ko gelek car pêwîst dike komelga li berelayî û destdirêjî û pîyawî xerab dûr bixirêteve û rê nedirêt ko rastî mirdar bêteve. Ko wata li vira da dîktatorîyet şerîyetêkî mêjûyî peyda diket, belam nek bo heta heta ye, çunke dîktatorîyetî hete hete ye, hîç amacêkî nabê.***

** Rayek heye ko wa Şikur Mistefa li biwarî bîrpêbirinê da pitir bi layî felsefê marksîst ve ye. Ewe evro li serdemî bicîhanîbûn da heye, ewe ye ko dinya bûbête gundêkî piçuk û li gundêkî piçuk da jî giftugo û hawarkirin biseryektirî da karêkî asane. Carna heye ev giftugo û hawarkirin çareserî zor xêra bo kêşeya galan jî dênête arawe. Xune jî mîlletekê weku me û dostekaxanîn ko eger rageyandinî cîhanî karesate kemanî bi dinya negeyandibaye li wate bû êsta ew harîkarî û çetreman bo helnediraba ko hemane.*

Şikur Mistefa: ***Min nek her qerzarbarî marksîyet, bigre qerzarbarî zor tişt im. Qerzarbarî hemû tiştêk min ko ji wî fêrbûme. Rojgarêk min tesewif jî dixwêndeve. Bi min zor xoş bû, min ji wê karî jî dikir. Ez Kurd im û hez dikim weku ew mîlletanê dî bibim bi tiştêk, li marksîyet û tesewif û mela û şêx û axa û ... htd. Her kê bişên wa bikin ko rizgar bibim ewa ji wan memnun dibim.***

---

ji kovara WAR hijmar 14 hatiye wergirtin .